

## Sûriyê ji zarokan ditirse !?

Enehîte : Morad

**Di** sala -1954- an û di bin biryara -836-an de , encûmana gelemper ya navnetewî li encama şer ,ceng ,talan ,terorî ,dijîtî ,meşexite, penabereî û h.w.d, rojeke cîhanî û taybet ji bo parastina mafên zarokên cîhanê bê cudahî ava bibe pêwîst didît.

Çi û çiqas zarok temen didin û dibine qurban ?!. Vêca jî, encûmana gelemper ya navnetewî roja -20-ê çiriya paşin sala -1959-an tabl(lîste-fitik)a mafên zarokan bi pir xal û mercên balkêş weke rojeke dîrokî raguhand . Da ku zarok di heyameke demiquras û tundirst de perwerde û mezin bibin , encûmana navnetewî pêşinyar dikir ku , girînge her dewletek li gor merc û dîtînen xwe rojeke bêlikirî binirxînin û li mafên zarokên xwe xwedî derkevin !.

Her wisan jî, dewletên şaristan û demiquras ji zû ve li mafên zarokên xwe xwedî derketine û nirxên wan bê cudahî bilind û bilin hildane ber ve jor!?. Ma gelo kes dizane ku Sûriya me jî, di -5-ê -6-an-1993-an de peymanî mafên zarokan pejirand û bi şahinazî îmza xwe xistiye binê fitika mafên zarokan ! Bi vê awî li pêş raya cîhanê kirasê demiqurasî lixwekiriye ! Ma kî nizane ku va ye çil sal îne zarokên sûriyê di merc û hoyên zor dijiwar de li ber xwe didin !! Ew ji hemû mafên xwe bêpar in , hêmenî û hevpiwan di jiyana wan de nîne !.

Lew re jî, zarokên Sûriya me di heyamine xizanî ,cudahî ,terorî penaberî , tirsê û h.w.d de perwerde û mezin dibin !? Ev rijîma şoven û totalîst îro hemû mafên zarokên Sûriyê bin pê kiriye, tang û topên xwe dane

totalîst îro hemû mafên zarokên Sûriyê bin pê kiriye, tang û topên xwe dane sîngên bi çûk û nazdaran ,

gole û qûrşînên xwe bêsûc û guneh li wan dibarîne û dide çi reng kuştin !! ango rêzgirtina îmiza xwe nagire . Va ye bû bêirî çar-pênc heyv in rijîm har û dîn bûye, nikare li xwe vegere , vîn û hêviyên

hemwelatiyan bipejirîne û bêxwîn rêtin pîrsgirêka xwe çareser bike . Li tersî wê, ew kîn û zikireşya xwe, li serê zarokên reben dibarîne ! Loman jî , ra roja nivîsandina vê kurte babetê, bêtirî -40-zarokî bûne qurbana ezeziya vê rijîma dûrî tîrêjên mirovane ! weke mînak û nimûne :

Ew zarokê nazdar û delal li ber dilê dê û bavê xwe ku îro bûye sanbola şoreşa ciwanên Sûriyê Hemze Elî Elxetîb birînen li ser laşê wî pakirewan , kîn û çi mirovetiya Sûriyê baş diyar û şirove dikir !! Çiqa heyif û mixabin ku di dema vê rijîmê piştî xwe daye dijimin û neyrên me û bêşerim û fedî berê xwe daye zarokên bêguneh û qûrşînên xwe bê erê û na li wan dibarîne û navê xwe di rûpelên dîroka gunehkar û rûreşan de dicespîne, wisan jî, çi baş diyar û xuya dibe ku, duhatiya vê welatî ji zarokên Sûriyê re ye , deng û qêrîna zarokên mîna Hemze Elî Xetîb wê mîna zengilan di guhê mirovên bi rûmet de herdem lêxe , ta ku zarokên Sûriya me di heyamên Azadî , Aştî , wekihevî û demiqurasî de mezin bibin . .....

